VAZGAL BAZİDİ

# DİSA ŞER Û HESRET PARA ME KET

HELBEST

ROJA NÛ

Institut kurde de Paris

V
38

Institut kurde de Paris

# VAZGAL BAZİDİ

# Disa Şer û Hesret Para Me Ket

Institut kurde de Paris

INSTITUT KURDE DE PARIS
*Bibliothèque*
Reçu le .07./04./2021..

LIV.7538

OFFERT
PAR
JOYCE BLAU

Çıleyê Pêşin - 1989
ISBN 91 76 72 027 6

Institut kurde de Paris

WEŞANÊN ROJA NÛ: 29
Döbelnsgatan 16 B, 2 tr.
113 58 Stokholm/Schweden

# DİSA ŞER Û HESRET PARA ME KET

HELBEST

Institut kurde de Paris

WEŞANÊN ROJA NÛ

Institut kurde de Paris

## CENG

Mêjiyê mın da guleki sor heye
Ya iro yan sıbê wê vebe,
Dızanım şanebûm gori dılê xwe
Lê dılê mın da agıreki sor heye
Ya iro, yan sıbê wê harbe,
Mın ehd kır bo xebat nasekınım
Destê mın da çekeki gıring heye
Ya iro, yan sıbê wê bıteqe,
Êdi bê guman ninım
Dı pêşiya mın da Partiya Sosyalist
Nav karker û gundiyan da me ez
Ya iro, yan sıbê helan û ceng e.

Institut kurde de Paris

# MIRAZ

Delane delane
Rabın ser piyan
Xem xwarın
Ne karê mêran e.

Tekoşina me
Ne pır hêsan e
Xwin û bırin
Gırin tê heye.

Hova jorda tê
Karker û cotkar
Gel hev gırêdın
Emel û gotar.

Jina pêşiya me
Gelek pır xweş e
Riya Azadi da
Kurd ji dımeşe.

Mılletê dınê
Pıri serfıraz e
PARTİYA SOSYALİST
Bo Kurdan mıraz e.

Institut kurde de Paris

## GOVENDA ME

Dilan destpêkır
Ketıne dest hev bawermend
Dılê wan gışkan da
Keçeki karker
Şera seri kesk,
Sûret sor,
Por zer, hebû
Kılama Riya Azadi dıgotın
Qiz û xort ketıne rêzê
Karker hatın
Ser qeydê wan listın
Gotın, keniyan, çepık lêxıstın
GOVEND DIMEŞİYA
DİLAN GEŞ DIBÛ
Merıvên bı sımbêl, bı rû dıhatın
Hewş têra wan nekır
Pêşiya govendê çû
Qada ber malê gerkır,
Gundi ketıne dilanê
Ew roj
ROJA WELAT bû
GOVEND DIMEŞİYA
DİLAN GEŞ DIBÛ

Institut kurde de Paris

Nav dilanê da hınek derketın
Piyê wan lı hev geriya
Qeydê listıkê şaşkırın
Nekarin bımeşın tev xebatkaran,
Bo xwe nişan bıdıne
Qiz û bûkan
Xwe kışandın
Ber bı ser govendiyê
Tew, teeew,
Her tım paş ketın
Karker ser govendiyê
Nedıda tu kesi
Dawiyê,
Derketın jı rê, jı avrû
GOVENDA ME DIMEŞİYA
DİLANA ME GEŞ DIBÛ
Gav bı gav mıqam xweş dıbû
Saet bı saet
Pır dıbû mıllet,
Govenda me da
Kal û pir
Keç û xort
Gavan û şıvan
Mamoste û şofor
Dıleyistın yek qelem,
Mılê wan jı hev venedıqetiya
Gışk zana, hemû aliyan da
Ketıbûne dilanê
Tıliyê wan derbasê hev dıbû
GOVENDA ME DIMEŞİYA
DİLANA ME GEŞ DIBÛ
Deng hat
Jı welat dûr
Dilan mezın govend dırêj dıbû
Xelkê Kurd bê şık
Dılxweş kır ROJA NÛ
GOVENDA ME DIMEŞİYA
DİLANA ME GEŞ DIBÛ



Institut kurde de Paris

Karkerên derweyi welat
Ketıne govendê
Nav dilanê da dengeki dılsoz,
Dengeki xurt
DENGÊ KOMKAR bılınd bû
Rewşa govenda me
Xweşê xebatkarên dınê çû
GOVENDA ME DIMEŞİYA
DİLANA ME GEŞ DIBÛ
Sê dawet hatın bahev
Kêfxweş bû gelê me
Ser mıqameki
Ewana listın xêleki.
Dıjmın êriş ani ser dilana me
Yên tırsiyan sıst bûn.
Yên devê wan vebû vekışyan
Yên şehid bûn.
Bı mêrxasi berxwedan
Lê nesekıni dawet
GOVENDA ME DIMEŞİYA
DİLANA ME GEŞ DIBÛ
Me navê xwe belavkır
Lı suka Qamişliyê
Destmalên bûka
Lı ser çiyayê bılınd, jı Şengal
Nav dar û berê Mehabadê
Cemedanên reşbelek
Lı gel tıvıngên sorsorbûyi dıhejandın
Bıra û xwişkên me
Bı destên lerzok
Bı çavên şayi
GOVENDA ME DIMEŞİYA
DİLANA ME GEŞ DIBÛ
Ser govend, gula govend
Serbılınd bû.
Jı xwe bawer pır camêr bû.
Şêr, pılıng jê dıtırsiyan

Institut kurde de Paris

Wek bırûsk bû.
Ew nişana serketın
Nişana Azadiyê bû
Lema bêtırs û xof

GOVENDA ME DIMEŞİYA
DİLANA ME GEŞ DIBÛ

Gulanga Jorin
7.3.1980

Institut kurde de Paris

## WERE

Genım zer bû lı deştê
Berf nema serê çiyan
Mêzer perıti
Nema dêre
Neferê malê gışk tazi man, were.
Şirê memıkan qedya
Mıçıqi av lı kaniyan da
Neftê malê xılaskırın şêlanker
Sal ji dıbore ser salê
Bihna mın teng bû, were.
Disa kela-kela dılê mın e
Nav pencıra, ber deriya
Dıpêm riya te
Şûrê xwe tuj kırıye dıjmın
Lı ser hêlûna me yê eziz û kevn
Êrişê wan berdewam e.
Zarok bı zıman bûn
Qiz û bûk çav lı rê ne
Pırani rabûne ser piyan.
Tirê xwe
Ber bı ewrê reş gırtıne
Hêviya te ne.
Were,
Ser serê mın
Nav dılê mın da
Reş-tariyê belav bıke
Veqetine cendek lı seri
Bırıjine jarê maran
Bıla êdi gez nekın tu kesi
Bese bees!
Bıla were bı destê te
AZADİ

Institut Kurde de Paris

## PIRTÛKÊN ME

Wê derkeve stêrkên sor
Dûkêşên pavlikan, ê reş û taridan.
Nav mêrg û zeviyên welat
Paleyê bımeşın, ber bı ronahi
Wê bıtemırının ocaxa kedxwaran.
    Uha dınvise pırtûkên me
    Evê ji yeqin wê bıbe.
Xebatkar wek lêmışta wê berxwe bıdın
Kolonyalizm û imperyalizmê
Nirê bışkê, ser stûyê xelkê Kurd
Emê ji tambıkın cejna Azadiyê.
Bı dılên xwe, nav Kurdıstanê.
    Uha dınvise pırtûkên me
    Evê ji yeqin wê bıbe.
Xızani, nezani wê bıbe çirok,
Din êdi sermiyan nabe dest pirhevokan.
Wê têkbıçe bı destê zehmetkêşan feodali.
Hemû xwedi mêrg-zevi
Gundiyên me wê Azad bıbın.
    Uha dınvise pırtûkên me
    Evê ji yeqin wê bıbe.
Tırk aliki em vi ali mina bıran
Caw, fêki jı wan, nıft, genım jı me
Bıghurinın hev ne kêm ne zêde
Wê wekhevi çêbe nav netewan.
    Uha dınvise pırtûkên me
    Evê ji yeqin wê bıbe.
Qiz û xort jineke xweş sazbıkın
Lı her deri qenci, her deri bıhar
Wê gulvede, bıteyise Kurdıstan
Bı rumet, nav erd û ezman.
Û wê tu kes nemine bê xwedi bê par
    Uha dınvise pırtûkên me
    Evê ji yeqin wê bıbe.

Institut kurde de Paris

## BO ME

Zûva ye ev bırin.
Derbasê me bûye ev kul
Jı bav û kalan
Ne şêx hiştın ne mela
Geriyan ha geriyan.
Derd gihişte me, bı zehmeti
Em ne çûne ba şêx
Ne ji ba mellan.
Derman heye dıgotın
Cem karker û cotyaran.
Rabûn çûn
Gıhiştıne menzila wan
Kıtêba Marks-Lenin vekırın
Pêşiya mêvanan.
Ava nıvıştê nebû
Lênedan bı şıvê ter
Pışta me,
Xwendın-gotın
Tu qey bêji
Seba me nıvisibûn
Van tıştên han.
Tirêj tariyê konkır
Ronahi hıngavt canê mêvanan
Paqışkırın rê û dırp
Jı hemû astengan
Paşê;
Şırovekır, bıngehdani
PARTİYA SOSYALİST
Bona me Kurdan.

Institut kurde de Paris

## EY HEVAL

Bıxwine, bıxwine
Gel karkeran pê bavêje
Ne paş bımine
Ne gelek pêş bıçe.
Bıbe mamoste
Ewıli bo xwe
Paşê bo gundiyên reben.
Jêhati be
Pêkbine tıştên xweş
Û bo gel nımûne be.
Rık bıkute, ser axan her tım
Bısekıne ser bıryaran
Û bıbe heta seri qewlan
Birneke
Çavên gel lı ser te ye
Her roj, her gav.
Cehd bıke

Institut kurde de Paris

Tıştên delal, baş çêke
Nebe nanê sêlê
Bıla bawer bıkın
Guh bıdın gotınên te.
Seba şıxul, xebatan
Benda hevalan nesekıne
Tu xwe, bavêje pêş
Nebêje ev layiqê mın nine,
Ev mezın e
Ez serederi tê dernaxım
Bıxebıte, bıxebıte...
Bı egiti raweste
Hımber neheqiyê
Lı ber hovitiyê,
Jı xew û xeyalan dûrkeve
Lı ezman na
Bıgere lı erdê,
Dılê agır
Mêjiyê xwe yê ter
Bıtewine lı ser sosyalizmê
Bıkeve rêzê, ey heval
Ev e rêya serketınê.

Institut kurde de Paris

## HEVALÊ MIN

Wexteki şoreşger bû
Bıroyê newêrek,
Berf, bager
Şıli û şepa da, ma
Ba lêxıst hejiya
Çû-hat
Xwend-nıvisi
Bo nav herekê bû
Hate nasin
Qedr û qiymet
Xwe ejderha hesıband
Got, got.
Her qıse kır
Gava ajotıne ser
Dılteng bû
Zırav teqya cida ma.
Dema zor kete ser mıli
Reşeve hat çav
Wek hespê şıl bûyi.
Hûn bêjın malê dınê
Lê nehat,
Para ma
Jı tevger dûrket
Nerehet bû zewıci
Paşê mina çemê havinê
Mıçıqi ma...
Ne bo nefsa xwe
Ne ji bo cıvatê
Pêkani kareki.
Nota ava gola pıçûk
Geni bû,
Kurm kete dılı
Stara xwe heband
Neherıki,
Wext gıhişt
Mêjiyê wi rızi.

Institut kurde de Paris

## GEWRA MIN

Me ne dest hev gırt
Ne geriyan bın daran,
Bın darên hêşin bûyi
Darên, bı fêkiya dagırti,
Me ne têr hev dit
Ne heneka kır hevra
Henekên rasti
Weke ava zelal û pak.
Zeman nema bû ku
Em rewşa welat
Yê duwerojê bêjın hev
Fesla zıvıstanê ne bû
Em gale-gal bıkın
Şevên ziz û dırêj da.
Ne şa bûn
Jı serketına karkeran
Ne ji me xem xwar
Gel hev, seba şehidan.
Lê me hev
Rınd nasdıkır
Dılê me da tıji agır û hêvi
Ramanê me yek bû;
Yek bû riya me
Û em dımeşiyan
Bê tırs û bı serbılındi.
Gewra mın,
Me disa dızani
Derd û kul wê belavbe
Agır wê bıçırıse
Dılên me
Û çiyayên me da...

Xıziran. 1981 Sabûlax

Institut kurde de Paris

## ÇAVREŞA MIN — I

Hısret,
Dılê mın da bû kevan
Ewrê reş lı ezmana
Xwe dılıvine
Geliyên xweşık
Cılê mıjê lı xwekırıne
Teyrok dıbare
Ser bedena mınê tazi
Narıcıfım.
Rê-dırb hatıne gırtın
Jı bager-tipi
Çiya û zınarên asê
Bo mın nadın
Şıve rêki ji
Dajone ser mın ha dajon
Riya mın çık sayi ye
Û dılteng ninım.
Jı te dûr
Kani-çem zıwa bûn
Lêv qelişi, zıman hışk bû
Gewri da naçe nan
Lê ne bırçi, ne ti mam
Dıdım berxwe ha dıdım.
Qelem, defter, pırtûk
Xılas dıbe
Her tışt nışkêva
Dest vala naminım.
Dı gurbeti da
Baweriya mın neşkest
Ramanê mın qewi bû
Lê...
Mızgıni ji, nehat
Ne jı te
Ne jı welat..

3.8.1981

Institut kurde de Paris

## JI BO

Mal nemabûn ku
Şehid nedabûn
Xwin nerıjandıbûne axê
Jı bo Kurdıstanê.
Azad kırıbûn çiyan, hınek şehran
Tevê cılê gewr xemılandı bûn
Hevardorê Kurdıstanê.
Xwe bawer bûn
Zınar û cengelan hezdıkırın
Carna gul, sosın dıxıstın
Ser lûlê tıvıngan
Dımeşiyan nav bajaran
Jı bo aşiti û azadiyê.
Yên dil dıketın
Dema dıdane ber gullan
Bı tevayi EY REQİP dıxwendın.
Mırın ji bı serbılındi dıbû
Keç sıngên xwe yê dest nedayi
Dıdane ber hemlê dıjmın
Qey bêji gışk xwişka LEYLA bûn
Rabıbûn ser piyan
Cılên al-gewez, şerên zer
Kılit kırıbûn
Nav sandûqa bûkan.
Ber bejnên narin
Lıbasên pêşmergan
Cemedanê reş-sıpi
Wek alan dıhejiyan
Ser serê wan.

Institut kurde de Paris

Hın nav zeviyên zer bûyi
Nav çêreyên heft reng da
Desta tıvıng dıçûne şerê;
Hın bı şalên pışt dıpêçandın
Bırinên bıra û yarê.
Zarok ne dıgıriyan
Bın bom û gulle barani da
Dayik, xwişk û metan
Porên xwe
Ne tinandıne xarê
Rûçıkên xwe
Nav xwinê da nedıhiştın
Jı bo şehidan.
Keşk, pıncar, kartol
Û nok bû xwarın
Kevır, erd bû nıvin
Jı bo Kurdıstan
Bı kurti hemû xelk
Xwina xwe
Dabûn xelat
Jı bo welat.

Sabulax 1981

Institut kurde de Paris

## ÇİYAYÊN ME

Bılınd bûne ber bı ezman wek pêlekan
Yên hûrıkın ser erdê,
Mina berxa xwe melısandıne
Ewr û berf dostê
Çiyayê serbılınd û asê ne
Mıj nav kendal û geliyan reqs dıkın
Bı hevra jina xwe dajon
Bıhar û zıvıstanan
Kani, robaran da dıkışe
Ava zelal û sar
Taseki jı mırınê vedıgerine
Can dıde beşeran
Geliyê niveka wana bıhuşt e
Mirov qimiş nake guh bıde
Lema-lema çeman
Fiqinya teyr û çıvikan
Mıqameki tebiyeti pêktinın
Tevi bılûrê şıvanan.
Pıncarên bı tam
Gul, sosın, rıhan, beybûn
Hewayê paqış û xweşık
Hewasiyeke gerin
Pêxwas mina dewrêş û evdalan;
Şkevt bûne
Stara insan û heywanan
Ku xwe avitıne quntarê belekiyan
Her tım çiyayên me
Bûne dost û yarê Kurdan.
Bı rasti
Şermedar dernexıstıne me
Lê belê, mılletê Kurd ji
Heqê wan zınar û geliyan dane
Her hatiye hejandınê
Ala rengin ser serê wan.

Xelifan 10.8.1981

Institut kurde de Paris

## ÊDİ

Lıng ne gırêdayi
Bê zıncire mıl
Ne guh
Ne zımanê mın da elektırik
Ne ji,
Her şev qıfıl dıbe malıka mın,
Lê we dıfıkrinım
Hevalên gırti
Canfidayên Kurdıstanê
Ne rengê we bıxeyide,
Ne dılşıkesti bın
Baweriya xwe wında nekın
Lı çûyina dirokê,
Jı meşinê
Pêş da dıçe doza me
Şerkarên welat dajon
Dı Riya Azadi da tekoşinê
Roj bê, wê bışkê
Deriyê zindanan
Ne dûr e
Ne dûr e Azadi
Lê çıbıkım ev tıştê evzal
Bê gırtın û bê mırın
Heta nuha
Ne gırtiye tu mılleteki,
Bawer bın
Lı dınê
Dor hatiye me êdi.

Xıziran 1981
Sabulax

Institut kurde de Paris

GILİDAX — I

Şêrasiyar, Tendurek, Ararat
Bangê Kurdan kır
"GAZİYA WELAT".
Serrakırın, şerkırın;
Berfa qerqaş
Gevez bû bı xwina me.
Jınên bı zar
Bı cendegên xwe
Yên bırindar
Bı dêrên heft reng
Pêşiya çemê Gırnewûkê gırtın.
Av mıçıqi, reş gırêda
Heyat neda mêrg û zeviyan.
Lê nıjadperest nekarin
Bıqelinın koka me.
Nıga ser wê himê
Gumrah dıbe tevger
Nêzık dıbe Azadi

Institut kurde de Paris

Gılidaxê da mêt
Dara azadiyê
Xwina mêr, jın û zaran
Ser çıqlên wê
Gihiştın xortên dılsoz
Wek MISTEFA
Wek METİNAN...
Geliyê Zilan xopan kırın
Xwişk, bıra kuştın
Hezar, hezaran
Jı wê vır da
Gelek fêlan kırın
Pır xwe cerıbandın
Gılidaxa şewıti
Bı tanq û topan şewıtandın.
Lê nıjadperest nekarin
Pêşiya meşina dirokê
Meşina
Azadiya Kurdıstan bıgrın
Nuha,
Bend, qeyd û zinciran
Dıqetine
Gelê Kurd,
Lı Gılidaxê
Pêşengiya Sosyalistan.

1.8.1981
Xelifan

Institut kurde de Paris

## CIXARE

Tıtûn darcıxare
Quti û heste,
Şevên dırêj da bûn heval
Mın xıstıne nav xeyalên kur
Carna ji derda.
Wext dıbû
Mina gullan jı mın dûrdıxıstın
Xema û kesera,
Pırcaran
Siwarê dûyê cıxarê dıbûm
Dıçûme welat, dıhatım
Bı ser şanê xwe re
Ez peyivim careki;
Careki ji azad dıgeriyam
Zıqaqên Diyarbekrê.
Kun dıkır agırê wê
Diwêr û kevıran
Ne kal bûm, ne ji can
Lê carna ji
Mın aşdıkırın
Ev taxımê han.

7.1.1981
Gulanga Jorin

Institut kurde de Paris

## ZERİ

Nuha
Dest nagije te
Mina çıvikek
Keskesori lı ezman.
Lê,
Heya kê deri bıfıri
Yeqin
Tu ya mıni.



Institut kurde de Paris

## ÇAVREŞA MIN — II

Roj du rojê dırêj dıbe
Dırêj dıbe dıltengi
Qey tikê roketeke bêji
Mina dukelek napalm
Belav dıbe
Dıpêçe canê mın.
Çavreşa mın,
Ne xeribi
Ne xem xwarın nine ev
Bê têkili mam qasek
Mame ser çiyan xêlek.
Lê bawerım
Rojeki pêş
Wê bıgije welat
Destê Azadiyê.
Genımê deştan
Wê bıxemıline hevardoran
Dengê motoran hin gumrah
Wê were bihistınê
Lı welat nav zeviyan.

10.2.1981
Gulgana Jorin

Institut kurde de Paris

MIRIN

Menale, menale
Ka wê bêjın
Çı bê qudum
Çı bê teqet ın;
Ewana egit bûn
Bı mêrani mırın
Bıki û bımıri baş e.
Berxwe dayina gırtiyan
Azadiyê nêzık dıkın
Bê şık wek Metinan
Baş e mırın...
Serê çiyan, nava geliyan
Dest da tıvıng
Nav paşla welata dayik
Baş e mırın.

24.4.1981
G. Jorin

Institut kurde de Paris

## XALO CAN

Bûk ım,
Lê ne şermokeme xalo!
Hıldıfırım, hıldıperım
Laçka serê xwe davêjım
Seba xortên rêz gırti
Çavên reş, sumetê sor,
Sıng-berê mınê
Bı bereket bıbinın,
Eşqa wan zêde bıbe.
Bıla guliyên dırêj bıgrın
Mın derinin vê zelûliyê.
Bûk ım,
lê hın ji
Xwedi mala xwe ninım
Wek bışkoriya
Bê zar, bê zıman ım.
Bûka xelkê zû va
Xwedi mal
Tevi zar û zêçên xwe bûn
Ez hin
Bûkeki ser bı xêlim e
Xalo can!

Institut kurde de Paris

Çendi çend caran
Destê mın hene kırın
Mın xemılandın
Siwarên mınê bıjarte
Hazır û amade bûn.
Pır mıxabım nekarin
Û xwina sor rıjandın
Bona mın
Reş-rût
Û gıre-gırê Kurdıstanê.
Xalo can!
Bo şakırına dılê kevne bûkê
Xeber bıghine
Destgırtiya mın Esan ra
Lı pavlika Şayaqê,
Gel kurapê xwe
Şıvan Sebri werın
Xalo can,
Bıla ewana ji
Elamê pısmamê xwe
Yên bajêr û gundan bıkın
Qefle-qefle, mıl bı mıl werın
Bıla mın xılas kın
Jı vê belangaziyê
Êş û keserên dılê mın
Bıghinıne dawiyê.
Xalo can! em çar xwişk ın.
Her çar ji vê halida ne
Sedan sal ın
Em nebûne
Kebaniya mala xwe.
Êdi,
Çı bêjım, çı nebêjım
Bo te...
Bûkeki usa me ku
Pir nabım,
Nakevıme dest-piyan

Institut kurde de Paris

Natevım dı bın zılmê,
Wında nakım
Hêviya xwe, jı te
Bızanıbe,
Tenê jı te xalo can!
Ez dızanım
Roja mın ji wê bê
Def û zırne wê lêxın
Cot bı cot,
Dewat-dilan, şayi-govend
Wê neqede
Mala mın da
Dızanım wê bıbe
Hım ji ne dûr e
Umuda mın Xalo can!

Geliyê Azadiyê
11.12.1981

Institut kurde de Paris

## BÛKÊ CAN

Bûka mınê delal
Rındi, bedewi
Hêjayi bo milyon mırınan
İro bı hezaran
Seba te rêz gırtıne
Kar dıkın ku
Te rızgar bıkın bın lepan,
Em zef dırengi man
Negıhiştıne kurê xelkê
Nezani, xızani,
Yek ji dest
Van axa û cehşan,
Her wext ser serê me
Bûna mina beraşa
Ev paşa,
Wek şûrê bı agır
Usa tûj, usa bı xwin,
Lê bawerbıke
Zaroyek çar sali bıgri
Heya pireki heyştê sali
Tu bırinek i
Dı kurayiya dılê me da,
Her usa ji tu derman i.

Institut kurde de Paris

Êdi, em
Êla mırtıba ninın
Xwarnakın seran
Stûyê xwe dırêj nakın
Bın niran,
Bori
Ew demên bê rêz, bê guman.
Bûkê can!
Gustila me lı tıliya te
Nota toqeki ji
Lı stûyê me,
Lê bızane
Asteng em nasnakın,
Jı derd û cefan têr ın,
Mırın bê
Ser seran, ser çavan.
Bızane hova ez,
Hova pêşmergeyên dılêr
Helan dane çarali welêt
Ser lêdanêne, lêdıdın.
Dengê mın war bûye,
Banzdaye ser sinorên vırek
Çiyan û deştan
Gıhiştiye reben, jaran.
Bûye al
Dı destê şerkarên azadiyê da
Nêzıke tu ji bıbi
Xwedi mal û zarokên bextewar
Serfıraz bıbi.
Bûka mınê dılovan
Û, wê bêjın
Hevkarê me yên dınê
"Were pêpar be"
Ev bûka can.

Geliyê Azadiyê
30.12.1981

Institut kurde de Paris

## DİL Û AZAD

Heya dûhê
Piyê te mın radımûsa
Bo perçek nan,
Bo têkıli namûsa mın nebi
Rêx-zıbıl
Pez û dewar
Lêdan-xeber
Tım lı ser mılê mın
Ker-gêj, nehış bıbûm
Tê negıhiştım
Çawa wilo dıbe?
Ez bın, tu lı ser
Her dayim,
Bıbhize ey bêbext!
Wê reşê mala xwe
Barke bıçe
Çilê were ciyê wê
Sor-sorgul wê veke
Lı her deran;
Qeydên diltiyê wê bışkê
Zıncirên jeng
Emê bavêjıne
Ser kulifengan,
Wê sıtranên me
Belav bıke xırabiyê
Mala zılme wêran bıke.
Govendên me
Wê korbıke
Çavên dujmın
Tev xebatkaran bıstêrın
Û emê bêjın
Tu nema koleti, bıji Azadi.

10.5.1982

Institut kurde de Paris

KEN

Dıranên çil sıpi
Lêvên şekıri
Sınga berfa rêti
Çawa xweş
Lı te tê
Tenê bıkeni.
Mırûz ne pak e
Xem lı te nayê
Veşeve were
Kember
Bıla bışıdine
Nava te
Her bedew bıbi;
Ne usa
Erd-ezman
Bıxeyidin ji te
Lê
Agır bıxe lêvan
Dılbırina şake.
Carna ji
Bısotine dılan
Bıkene,
Ber çavên mın
Bıçın mıj-dûman
Bıla neyê
Guhê mın
Dengê
Top û tıvıngan,
Tenê
Tu bıkene...

Institut kurde de Paris

## BİR

Ronahiya hivê ye
Ser çemê zê
Dıteyise, dılize
Mina keçekê
Çardeh sali şeng-şox
Dıl dıkeve
Radıwastım ci da
Xem û şayiyên
Rojên çûyi
Dıpêçe dılê mın
Cıxare ji
Nakewine kula dıl
Zê
Mın hılda bır...
Dızanım rê dûr e
Lê mın xwe berda
Nav pelên avê
Dıhejım,
Xwe dıhejinım.
Cıxare şewıtand
Tıliya mın
Dengê hevalan tê
Porên dırêj,
Avırên wek tiran
Kena teyê xweşık
Roda çû...
Ez gihiştım hevalan.

Institut kurde de Paris

## ÇAVREŞA MIN — III

Xem, xeyal
Dıl û canê mın, çavreşa mın
Agırê gur kır karker
Jarê me rabûn
Rêz gırtın
Nav tevgera me,
Çavreşa mın,
Tav
Her roj bo me hıltê
Du behrên bê ser, bê bıni
Û pışt çiyan,
Çiyayên bı berfan
Qerqaş bûyi
Sıtarê me pêşmergan.
Ku zıkê xwe da veşartıne
Gelek tıştên
Ne goti, ne diti.
Hım agır
Hım av e dıbêjın xem
Lı wır
Nav şıkevtan.

Institut kurde de Paris

## EMRÊ ME — I

Sılo xar dıkır serê xwe
Lı pêşiya axa û began,
Ber cendırma û polêzan
Dılerızi
Çav tırsandi bû
Şev roj dıxebıti
Keda rojê kadxwar mêtın,
Du emelên şevê
Zêde bûn zaroyên wi.
    Eyşê keçeki kaw û kubar bû
    Lê bav
    Nav belangaziyê da
    Wê mezın kır
    Çû mêr kır
    Lı pıştı, keça wê Berfo,
    Her desti da du lawık
    Hevardorê
    Zaroyên hûrık-mûrık.
    Mer lı nav mıl
    Her roj dıçû bıstanê
    Ew ji pır dıtırsiya
    Lı begê malê
    Gava dıdit cılê paqış
    Xwe xûzdıkır
    Heya erdê.
Çar jınên heci Mûsa hebûn
Celeb-celeb fıstan lı xwe dıkırın.
Şev na roj xev dıkırın.
Hemû ji
Wek mehinên Ereb, kehêl bûn.

Institut kurde de Paris

Heci Mûsa
Xwedi tıraqtor, erdên fıre bû
Panzdeh xulam
Lı gel jınên xwe
Şev û roj
Azet û xızmeta wi dıkırın.
Bıharê heya
Payiz da dırengi
Bı hezaran pale kardıkırın.
Zıkê têr
Gerdan tıji û sor
Hasıli Haci Mûsa
Bıbû mina têr.

> Cemile xanım
> Nav lı ser e êdi
> Xanımeki xanıman bû
> Çavê wê dıbırıqi û dıteyisi
> Bajarên gıran
> Dermanê ecêb tinandın
> Xwe dıxıst
> Rûyê wê dıbû
> Wek keskesora texlit.
> Dı mil-mıli
> Kuçan û caxdan
> Tu kar nedıkır
> Ne mal ne ji der
> Mêrê xwe heznedıkır
> Rıza beg ji
> Lê razi ne bû,
> Bo wê ji
> Ew riya xwe
> Cemile xanım ji
> Dı şevên tari da
> Emelên xwe dajotın
> Bê ar, bê heya.

Institut kurde de Paris

## EMRÊ ME — II

Şêro,
Gava şıxûl dest keta
Kardıkır bê westan,
Ewlin
Jı xwendınê heznedıkır,
Paşê
Fenayê aşê maşinê
Dıhêrand
Nav aqlê xwe da fıkran.
Bû bırûsk
        Sot..
Bı hevalan va
Ajote
Ser bındesti û hejariyê
Nota bızotan,
Eql û mılên xwe
Da xebatê
Dı ci da.
Jê tırsiyan
Rê dırp gırtın,
Avitınê
    Nav tariyê;
Nıha ji lı wıra
Şêro dışıxûle
    Mina fındê.

Institut kurde de Paris

## EMRÊ ME — III

Elo ji zaro bû
Lê ne wek
bında du çerxe
Nav sukê dıgeriya;
Dest da pırtûk û qelem
Lı riya mektebê dıçû
Ne ji
Cılên xweşık lıxwekıri
Serê xwe dani bû
Ser çoka dayikê.
Belêê, belê.
Elo ji zaro bû...
Dıçû ber berxan
Ew ji yê axan
Dest da şıveki,
Jı dara gêlazê.
Pışt da tûreki
Ku parsekokeki heyştê sali,
Nedıdit xwe ra bıgerine
Usa qılêr, perıti.
Nevaleke kur bû
Vekıri bû sıngê xwe
Darıstan,
Jı bo hêşinayi
Her usa ji
Bona Elo û berxan
Nışkêva erd hejiya
Yeqin qıyamete... got
Elo

Institut kurde de Paris

Xwe avite bın dara guzê
Paşê,
Serê xwe rakır.
Darên aliyê gundê Mirava
Waldıgerin ser hev,
Lı nav dûman û kevıran,
Hış hate seri
Revi...
Revi gihişte gundê Gozelê
Qirya lı ser çiyê
Bangê gundiyan kır.
Hatın, pastar hatın!
Gundi kombûn
Lı ser gıreki.
Zarok dora Elo gırtın
Dı kendaleki.
Hova
Teze qıyamet qetya
Bombeki.
Na, na...
Roj lı ezman
Kete ser wan.
Şewıtin
Dışewıtın zarok.
Fosfor dıgot
Dıxtorê Fırensi
Melleyên qasıdê xudê
Uha anine
Lı Kurdıstana İran,
Serê lawên Kurd
Ên heyşt-neh sali.
Paşê
Çûne nımêja inê
Û
Xudê wana effu kır!

Institut kurde de Paris

## MIHACIR

Destmaleke
Lı berikan mayi,
Jı bav û kalıkan
Me ra
Ev mıhacıri.
Ne destê wi
Jı me
Ne ji
Destê me jı wi
Dıqete vê gavi.



Institut kurde de Paris

## BES

Bê gotın zor e
Çetıne gurbeti
Heval hogıran
Jı yar û dostan
Durketın zehmet e.
Dıjwar e xem kışandın
Rojek lı wır
Rojek lı vır
Mal lı ser pışt çûyin
Ne hêsane
Hêsan nine
Wek qereçiyan gerin.
Lê, tu tışt
Nıkare
Pêşiye ramanên qewi
Û bir baweriyê bıgre
Bıfetısine.
Bes
Bı gırêdayi tevgerek
Tekoşer û sosyalist bi.



Institut kurde de Paris

## RINDİ

Mêjiyê pirhevokan
Pêpezkın
Tırs-xof bıla nemine
Û teniya sêlê
Eniya cehşan xın,
Dılên êş û kul
Merhem kın,
Kurmê nav xwe bıkujın
Ku serbest bıjin.
Agır bıbarinın
Ser dujmın,
Bomban hılinın
Çı pıçuk
Çı nötron,
Moriya xewê
Jı guhan derxinın
Ku hışyarbın gelê bındest
Aşıti-edlayi binın
Deynın, belavbıkın
Çar ali dınê
Usa ku,
Tıştên xeternak
Nekevın xewnên me ji
Usa ku,
Kedkar xêr û bereket
Bıreşinın malan
Usa ku,
Nêrgız bedewi,
Rıhan rındi,
Zeri û dilber
Gel maşinên elektronik
Sıpehi bıkın cihanê.

Institut kurde de Paris

## DEWRAN

Sala 1980
Meha Adarê
Av dıdıne hesın û daran
Dar û ber
Serê xwe rakırın
Jı xewa zıvıstanê,
Kulilk erd qelaştın
Rêvekırın
Bo bıxemılinın
Dor berê Diyarbekırê.
Teqıniyek hat
Tari kete erdê
Gırtın lêdan
Newroz baş çênebû, heliya
Heliya berf
Lı zozanan,
Dicle rê neda
Pelên wê har bûne
Man,
Mane nav çar diwaran
Sura Diyarbekırê nine ev
Wek tabuteki
Teng û tari
Man,
Hevrêyên me man
Lı wır
Lı meydana egit û şêran
Disa dewran bûye
Dewrana tekoşeran

29 Nisan 1983

Institut kurde de Paris

## NEWROZ

Bışkokên hesın,
Kılidên pola
Ber mıkutên me şıkest
Agırê Newrozê heland
Hesın û zınciran;
Gulên nû bışkıvin
Awaz-awaz,
Xemla daran
Reng bı reng neqışandın
Hevardorê welat;
Bihna gulav
Bısk û keziyan belav bû;
Bıjangan xweşık
Wek tir tûj kır
Kılê Sıphanê.
Bı kaw û kûbari
Herıkin zeri nav kûçan;
Pir destê neviyan
Kal tızbiyên kehrıbar gırtın
Ber bı ronahiyê

Institut kurde de Paris

Newrozê dıçın.
Xort
Kefi serê xwe pêçandın
Agır-alav xıstıne
Nav berika paşlan
Bı hêviya
Xelata dıldaran
Bo xelatê bıdın wetan
Bın ezmana şin
Ser erda reş
Rêketın dıçın...
Me hemûyan
Sala heyştê şeşa
Pışta xwe daye xıraba
Pêşiya xwe daye avayiya
Bı şer
Bı şahi dıçın.

1983

Institut kurde de Paris

## SALA NÛ

Dı pır pıte dıl
Jı yekıtiyê, hêzbûnê
Biz-bizi bûye
Porê hemûşkan
Agır me dıkşine
Ber bı xwe,
Jı dengê def û zırnan
Pê nasekıne cih
Dılşad ın,
Agır ın,
Saleke nû destpêdıke.
Rojên şerê
Rojên serfırazi
Nêzık dıbın
Bo me Kurdan.
Jı rojên teng û tari
Dılop, dılop
Paqiji, bextewari
Nısıli,
Bo tola şehidan
Bo şerefa Kurdıstan
Bı vê Newrozê disa,
Şereke nû
Gaveke pêş davêjın.
Çırûskên hesınê
Jı ber çakûca Kawayê hesınkar
Dıpeke, belav dıbe
Tariyê, sor reng dıke
Xurt dıke dılê egitan
Û gur dıkın
Agırê Kawa vêxısti
Bı baweriyeke kûr
Bı navê nû
Feridun rêdıkevın...

1983

Institut kurde de Paris

## BAYÊ ARARAT

*Bo Aram*

Tu xêr hati jı Hayestan heta vıra
Cinarê mınê kevn Aramê bıra
Bêna sosınê çiyayên Sasonê
Rugeşiya zozanê Elegezê te ani vıra.

Keda te lı nav sezbendiya me
Wek serê çiyayê Gılidaxê heykelek e
Xûdi awazê xweş û delal kırivo
Newroz disa dest me bûye çek e.

Lı gurbet agırê hesretiyê te gur kır
Av reşande dılan te hênıkayi kır
Reng û deng zıza me tu her bıji
Cejn û eyda me te iro şên kır.

Bı Newroz û bı te roni bû êvarên me
Vê gavê gurbeti êdi ne xem e
Jı me hemûyan sılav bıbe Hayestan
Rabın tev bıgrın govend hova ev dem e.

Emê lı ser Erez pıran çêkın
Neqş û xemlan lı dorê kın
Bê pırs bê pas herın werın
Axçik lawan, keçık tıxan hev mar kın.

Adar 1988

Institut kurde de Paris

## PARTİYA MIN

Ronakê da
Deşt û çiyayên Kurdıstanê
Dılê mın da gul veda
Per-baskê mın
Partiya mın.
Kor bûm bı çav,
Ker bûm bı guh,
Şıl bûm lı lıng û mıl
Da mın
Partiya mın.
Ez endam Parti hêlin
Hılda bıngehê xwe
Jı Marks û Lenin
Pêşiya gel vekır
Çek da dest
Çekek gıranbuha
Şerkır bı wê çekê
Gelê me bı egiti.



Institut kurde de Paris

Ne bı lez
Gav bı gav pêşket
Ew armanc
Belav bû,
Ci-war bû
Lı her ali welat.
Ramanên Partiya mın
Dızê
Jı çavkaniya sosyalizmê
Lema kar û barê mın da
Kurdıstan
Dı Kurdıstanê da
Sosyalizm heye.
Partiya mın
Tu,
Sıniya zivi lı ezman,
Kureyê Zerdûşti lı erdê
Dıçırûsi
Nav roj û şevan.
Nayê fıkırandın
Bê te jiyin
Mina hewa, av û nani
Jı vê şûnda
Şaşi-gêji bû çirok
Dest vala te ne hişt
Ne mın,
Ne ji
Xebatkarên Kurdıstanê.
Her bıji Partiya mın,
Her bıji.

1980

Institut kurde de Paris

## PÊŞMERGE — I

Bın reşayiyê ezman, lı şev
Stêrkeke lı dıl dıbırıqe
Dengê hevalan,
Guşiyê tıriyê sor e,
Dı dest da tıvıng
Waldıgerine, qonaxên zêr-zivan
Bı nuh va dajo, zeviya
Bı toyên nujen
Bı xwin xûydan av dıde mêrgan.
Bılûr lêdıxe mıqamên te,
Deng dıde geli-zınar
Nav şkevtan,

Institut kurde de Paris

Robar dıherıkın bı rık,
Guliyên daran, dıhejın nav' avê
Lı ser gotınên te.
Tu lı ser xakê Kurdıstan
Meyt bi lı erdê,
Disa ji xof dıxi dılê neyaran
Xurt dıki baweriya me
Çilqerqaş, mina berfa Şengalê
Bıhar tê hışyar dıbe, seri radıke
Hemi beşer, lı wır, lı Kurdıstanê.
Dı sanduqê da, çêyızê te
Bı xwin, bı gırin, bı hêvi
Tıji ye devi-devi
Canfidayê rêgayê nıştıman.
Hısret, şer, xayini ditın
Me pışt çiyan, mabeyna erd û ezman
Mêrxas, ditın ev erdên hêvidar...
Darên xêlibûk, qulıngên bask bı reng
Û kevırên hanê ku bıbû kozık,
Çiyayê Agır, Sipan, Qendil
Hemû geli, newal,
Dınvisın mêjuyê xwe
Her tışti, ev ruhber, neruhber
Ev gelên Kurdıstan.
Vala neçû emr,
Bı rûmet, ber bı jor e ser.
Çırûskên agırê dıpekın
Pêş lullên tıvıngên kalaşnikof
Peyvên delal, dahatuyên serfıraz hene,
Lı her gavê pêşmergeyên dılêr.

26. 11. 1984 / Nurnberg

Institut Kurde de Paris

## LORÎ

Bê gırin, bı şahi,
Bı hêvi lori
Ey zarokên Kurdi!
Hova ev welat
Têr û tıji, rıji xwin
Pır rıji,
Ey zarokên Kurdi!
Bê qirin, bı şahi,
Bı hêvi lori,
Usa ku nasneki derd û kulan
Bo te ye, evqas cefa, ev halan
Bê keder, bı şahi.
Bı hêvi lori,
Ey zarokên Kurdi!

Institut kurde de Paris

ZAROK

Çı bedewi, çıqas şırin i tu,
Wek welat, wek hêviya mın,
Negri, ne lorine tu.
Xweş bılize, devken be,
Mina karkeran, bı rasti
Bıde ser hev kevıran,
Çêke mala xwe, riya xwe serast bıke.
Mihriban be, gel hevalan
Gul-gewheri tu.
Tu yi rojên pêş
Û duweroja me
Û, dınya bo te ye, tev tıştên delal
Zêr-zeberi tu,
Bo Kurdıstan hivayi tu....

13. 7. 1985

Institut kurde de Paris

## HÊVİ

Bıngehek kûr fıreh
Rehên şeş tebeq bın erdê,
Ser erdê hezaran tirêj
Bı sedan reng, bihneki ne teng,
Paşeroja bedew, baweriyek xurt,
Hova Hêvi.
Ne dışkê, ne têkdıçe,
Dı nav dılên dılêr.
Rewşa heri ne baş, riya xeter da,
Bın siya nızê neyaran,
Lı tenışta şehidên bıra,
Her pêşta çûyine
Baweriya roja Cejna Azadi,
Natemıre lı her ciyê bedenê
Agır Alavên wê.
Hima karkeran dani ev e heval!
Bê guman nake mirovan,
Badılhewa naçın xebat,
Bend û qeyd, zıncır û zindan,
Naşkêne hêviyê,
Hêvi, hêviya me ye,
Hêviya me ye
Cejna Azadi.

15.7.1985

Institut kurde de Paris

ŞIÊR

Gullên kuştınêye, bo dıjmın,
Her bêje,
Û hêvi ye bo yar û dostan.
Xurtiyek bı rasti dıde çokan,
Hêzeki gıran
Dı nav tarixê dertine
Dıke nav reh û xwina,
Xem û kulan derman dıke,
Rûdızvırine rojên kevnare,
Û dıde ber bı rojên şırin.
Hısreta dıqedine,
Lı hev hatınê tine ber deri.
Kêlendi lı ser mılê pale,
Destê karker, dı nav çerxên makina,
Ser kaxızê spi, pênıvis dışqite
Nav tıliyên şaıran,
Evana dıghijın hev,
Bı hêz dıbın, em.......

**20.10.1985**



Institut kurde de Paris

## HİV NE DOST E

Roj xwe berda nav çiyan
Lı ber çavên me,
Çiya hın bedew bûn,
Wextê rêketınê hat,
Tepe-tepa lıngan,
Me kena bêdeng dit,
Beşera me xweş bû,
        paşê...
Dıjmınê me derket, hılat, hiv
Jı aliyê rohılat.
Ken belav bûn lı rûçıkan,
Ciyê tari geriyan,
Me xwe avite taldan,
Ne teqe-reqa sol,
Ne ji pirqe pirqa bêdeng...
Çırûskê çavan, tenê xûyaye êdi,
De gıdi,
De gıdi, heyran,
Heyrana te bım ewro!
Ewrê reş,
Reş tari bıke ezman...

Institut kurde de Paris

Em bêjın:
Belêê, bı rasti şev e,
Û rêbıkevın, bı dılên xwe.
Kê dıbêje, dost e hiv,
Nişana bedewi, fenayi keçek çardeh sali ye,
Na, na xêr!
Ne dostê me, ne yarê pêşmergan e ew.
Me nişanê dıjmın,
Dıjmın nêzıki me dıke.
Dema hiv dertê
Mina arpiciyek berdi tankê,
Usa bı gurmin ronahi dıke,
Der dorê şervanan.
    Wexta ew çardeh roji dıbe
    Hın xırabtır e,
    Neyarê pêşin e
    Newal, bı newal
    Kevır kuçıkan dıde diyarê.
Tu ne yar, ne dosti hiv,
Ne aşûq maşûq ın
Te hezkın em iro,
Dı bın ronahiya te,
Kılamên xwe bıstırên,
Hemêz bıkın, bıkevın laqırdiyan
Bı yarên xwe va û bı te ra şabıbın.
Jı me nexeyide,
Lı vê demê tu ne dost i.
    Ne ku em jı te heznakın,
    Dexesi dıkın, jı delaliya te,
    Dem dema te nine
    Naxwazın tu derkevi,
    İro nav vi şeri,
    İro dı nav şevên Kurdıstanê.

14.9.1985

Institut kurde de Paris

## ROJA ME

Reşayi erdê ketiye,
Kela dılê me, bêtır seri rakıriye
Û xwina me,
Hın sor gewez kıriye hêsûyê welat.
İro,
Karkerên me rêketıne,
Komkırıne lı ser hev
Reş û rûtan,
Gelê Kurdıstan, geli mêrxasan!
  Roja me ye..
Tengezari dıçe, nema tê bihntengi
Wextê beybûnê tıji bû
Bıla bıçılmıse,
Agırê dılan gur e
Sıtêrkê geş dıkevın pêşa me,
Û nêrgız seri hıldaye
Hımber axa reş
  Roja me ye iro...

25.9.1985

Institut kurde de Paris

## GLİDAX-2

Bihna te,
Hewa û berfa te, nine lı vır
Tu çiya nagre, ciyê te
Ne gur Heso, ne egit Ferzende
Hiştın şkevtên te, bê dewsa pê
Tu kevır kendal nehiştın
Ku xwe ra kırın kozık
Û tu Kurd nine,
Bı te serbılınd nebe,
Hela ez...
Ez dılkovan, ez dılovan,
Ez goriya te me
Glidaxê Kevan.
Kuliyên berfê
Dılopên baranê te
Tên bira mın,
Lerzeki xweş dıkeve
Can û bedenê mın.

Institut kurde de Paris

## WERIN

Ne ez,
Ne tu dımini
Rûberê vê dınyayê,
Deh caran
Dıkare me bıkuje
Atom û notronên wan.
Ewana ku
Bı zıkên têr,
Bı rûçıkên zer
Ser zêran rûnıştıne
Û xwina sor
Ketıne çavan,
Dıjwar nine
Dest bavêjıne
Bışkokên fûzan
Û alemê wında bıkın

Institut kurde de Paris

Yekcar,
Nışkêvan...
Dıvê ez û tu
Em û hûn nehêlın
Ku teb nebe hêlûn
Ser jın û mındalan,
Pez û mırişkên me,
Gulên baxçan
Neqelın jı kokê va.
Ewrên reş û gewr,
Alavên sor û zer
Mırınê neynın,
Zaru stûxar nebın.
Werın!
Em mecal nedın,
Destên pırşing û krûzan
Jı erd û ezman bıqetinın.
Tırs-xof,
Tatêl û gırinê
Jı dılan derxinın,
Ku pêşkevın
Ber bı stêrka sor
Cımaet serbest,
Gel hev serfıraz bıjin...

Institut kurde de Paris

## NEWROZ TÊ

Lı dınê
Çendi çend kulilk bışkıvin
Çendi çend zıvıstan çûn
Gıhiştıne bıharê
Û çendi çend berbang çırand
Şevên tari,
Îro ji
Ajdıdın gul, ber bı Newroz
Nav xwinê roj hıltê
Lı ser Kurdıstanê,
Stêrkên soronek, nav şişên reş
Ber deriyên heft kılit derketın
Jı sıng û çavên gırtiyan
Pêçand dorberê taşxana Diyarbekrê,
Pışkê xwinê lı ser hêşinayi
Lı Hewlêr, lı çiyayê Zaxoyê
Newroz tê,
Newroz tê, lı suka Mahabad
Belavok bın deriyan
Tıvıng nav mılan
Lı ser lêvan ken û rık
Dıl lı nava destan
Pêşmerge,
Seranser xemılandın
Ronahi kırın, tev lı ser Kurdıstan.

1988

Institut kurde de Paris

## TIVING

Ez jı te,
    Çıqas hezdıkım
    Tıvınga mınê nazdar,
Ku xeyidiyi,
    İro lı wır...
Lê bine bir
Lı Dêrsım, Zilan,
Jı Şengal
Heya geliyê Qasımlo
Û, vêşeve were
    Bı mın ra.
Ez dıxwazım,
    Tu ji dıxwazi?
Em herıne wan deran,
Ez hazır, tu hova
Êdi em çı dısekinin
    Van dera?

Institut kurde de Paris

## STÊRK

Merıvên berê
Rûyê xwa dane qıblê,
Aliyê kevırê reş,
Me,
Rûyê xwe zıvırande, başûrê,
Dıçurıse, dıbırıqe,
Ku me ra
    Sılavên germin dışine,
    Lı ser çiyayê Elegezê.
Ewana ku
Lı gerdana xwe
Dalıqandıne hivê,
Stêrkên geş dıpekın
Bın piyê hespên wan,
Hespên sım spi,
    Bı bask,
    Dıfırın,
    Ewrên reş hıltinın
    Lı ser cihan.
Erez du dıl e,
Lı wır,
Yek sor, yek reş e,
Dıxwaze, bıbe yek dıl,
    Dıleki fıreh,
    Dıleki bı dılê te dıl
Ku avde, giyan bıde,
KURDISTAN...

Institut kurde de Paris

## LI WELATİ

Şev nabore,
Nav paşla kul û derdan,
Mın aş nakın
Tıştên ne tu tışt,
Rızgar nakın xewn, xeyal.
Nayê ser lêva mın,
Zman nagere,
Pênıvis naşqıte ser kaxızan,
Çawa bêjım, çawa?
Çılo xıl û xweliye dılê mın...
Keçên bedew û narin ra,
Ne sılav, ne dıldari,
Lı ser te bo mın heram,
Her tım, her deri,
Nayê gotın bı rasti,
Nêt û meram.
Bıhar nedit,
Ne can, ne ji dıl,
Nızanim çıqas xweş e dılşadi,
Amın ım,
Yeqin bıhuşt e,
Wekhev û azad gerin,
Lı Welati.

**15 Sıbat 1982**

Institut kurde de Paris

## BAYİZD

Bayizd xweş e
Beramberi Gılidaxê
Gılidax xweş e
Lı pêşberi vê dıjmınê
Dıl bı kul ın
Robarên Dêrsım
Mêr-mêrxas
Serê Kurdan bılınd kırın
Lı wır, tev hev
Kurmanc û Zazan.
Bê şık payitexte Diyarbekır
Karkerên camêr
Ala sor
Bılınd kırın her wext
Ser sûrên wê
Rûyê me spi kırın.

Institut kurde de Paris

## PÊŞMERGE-II

Ey pêşmerge
Ey dılsozi welat!
Aşa şoreşê
Bı xwina te dıgere
Û dıhêre,
Bındestiya hezar salan.
Ne vedıkışi,
Ne mılê te kul dıke
Barê Kurdıstan.
Nemayê dıltengi
Bûyi canpola
Wek guliyên yarê
Dıgri tıvıngê,
Her wuha
Hezdıki jı dıl,
Kevırên welat
Neftên bın erdê.

Institut kurde de Paris

## YEK GULAN

Behra kulilka ne
Navda wunda bûne beşer
Tenê Marks, Lenin
Ser piya ne
Û
Veşeve tên dınê ra.
Ketıne mılên hev
Hemû cihan,
Destên
Mılletên bındest gırtıne
Wana hemêz kıriye
Welatê sosyalist
  Welatê Lenin.
Şoreş e, dıkele dıl,
Şayi lêvan belav dıbe,
Hesûdi nemaye
Nav gışk tıştên bedew da
Hefti-heft zman tê xeberdan
Tê dıghijın, hemû mirov
Çawaye eyd, cejn
Lı welatê azad
Welatê Dimitrov

1 Gulan 1983

Institut kurde de Paris

## JI TE DUR

Me çı dit,
    Çı nedit, got...
Me gelek tıştan
    Da avê,
Gelekan ji gırt
    Bal xwe.
Tu car kêm nebû
Geşiya stêrka sor
Dı nav sıngê gewr da.
Me bavê tırsê dit.
Jı me newêri
    Revi, çû
Kete bın heft tebeq erdê.
Jı xwe bêtır
Hezkır,
    Me zarokan, ku
Dıçûne pêş.
Lê bırako!
Bı zehmet û êş
Çı deyşt, çı zozan
Hemûyan geryan
Sosın û gulan bihn kır
Dit, pır welatan..
    Welatên xweş
    Civatên serbıxwe,
    Erd berên xêrdar,
    Hemû geş, hemû bextewar.
Lê, neçû jı bira me
Negırt ciyê wê,
Welatê me yê neftê, xêrê
Û, stûxarê.

Institut kurde de Paris

## DILOVAN

Kê jı bo welatê xwe
Nine dılovan?
Wextê çiya dıbinım,
Kumê teyê spi
Ku danayni bıhar zıvıstan,
Heykelê teyê reş
Ku sedan sale nalıvi,
Tê ber çavên mın
    GILİDAX!..
Esan Nuri Paşa,
Şêx Evqadır
Hesoyê Broyê Têlli
    Şerkırın,
Ser kevırên qetran kıri
Nav şkevtan,
Seba welatek azad
Jı bo ax!
    GILİDAX!..

Institut kurde de Paris

Kijan kes
Tenê carek bıbine
Û bıkarıbe te birke?
Neqşên ser te,
Kevırên bedew,
    Ser kevıran,
Û tarixa teyê
    Nav tarixan
Kelayê Behlûl Paşayê Kurdan!..
Kê cısaret dıke
Ehmedê XANİ
Melle Mehmûdê Bayazıdi
Jı nav kıtêban
Ser û bınê erdê Bazidê
Bine der, bıbe dûr,
Hûr, hûr têne bira mın,
Û dırêsım
Hısretan, dı dılê xwe da
    Hûr-hûr.
Kurdê Kurd be
Jı te derxine dersan,
Nav xwin û hesti
Dest gırti, dest vala,
Hatıne ser te
    Nıjadperest,
Tev beg û axan,
Disa ji, te berxwada
    ZİLAN!..

Institut kurde de Paris

PÊŞ — I

Erd,
    Keçeki 14 sali,
    Hêvidar e.
Dıbışkıve gul,
Aj dıde giha
    Her gav lı wıra...



Institut kurde de Paris

## II

Dızanım
Her pêş da ye
    Dılxweşi,
Murat dıherıke
Dıçe dıghije Fırat
Fıratê har,
Fıratê xêrdar,
Û Fırat,
Tıştên kevnar, gemar,
Da berxwe
Şipa şoreşê ji
    Wana avite
    Behra reşa kûr,
    Bıçe, her bıçe...

## III

Zarokê mın,
Nav mal wê vebın,
Mina kulilkên bıharê.
Wek guşiyên tıri.
Bıbarinın ser me,
Maşine bereket,
Wê bıpekinın
    Rûgeşi
    Ser belengazan.
Jı bo ku
Lı hev werın
Bı axa sar va,
Hesretiya wanê
Hezar salan
    Bıqede...

Institut kurde de Paris

## “XANİ”

Şêresiyar
Kela Behlûl Paşayê Kurd
Û çiyayê kevıran,
Te hembêz kıriye
Gılidax nobedar e
Lı gel ehlê Kurdıstan
Û te dıparêzın Kurd,
Wek duweroja xwe
Jı çika çavan,
Jı êrişê neyaran.
Pêşımikê te paqış dıkın,
Kevırên tırba te,
Bı qedır û siyanet radımûsın,
Her roj insan.
Bı navê te mezın bûm
Navê te mın sond xwar hertım
Tu bo me rêber,
Serwêr û zana yi.
Dergehê fıreh te vekır,
Bo ku em ji mılletek ın
Bı zar û zıman,
Bı ılm û irfan,
Bı edep û tore ne.

Institut kurde de Paris

Heyiyê me,
Jı devki derxıst
Kıre destanê MEM Û ZİN
Kıre heykel nav çanda me.
Mekteb medrese te vekır,
Şagırt elımand,
NÛBARA PIÇÛKAN
Te nıvisi bo me hemûyan.
Kewneperest û zordest,
Kıt bı kıt komkırın,
Pırtûkên te
Û şewıtandın.
Nıvisarên te yên ser kevıran
Hatıbû neqışandın,
Koledar hıldan bırın,
Danine bın himê mahfêlan (1)
Ku wında bıkın.
Suxtên te
Gırtın, lêdan, kuştın
Lê nekarin armancê te dani
Ramanên nav dılan
Bıfetısının...
Gelek hejandın
Ku fêkiyê te yê
Ser daran bıweşının
Neminın,
Neminın lı nav erd û ezman
Mırazê wan
Lı çawan da ma,
Hunermend, nıviskar û hozan
Pırbûn, şaxdan
Lı her perçên wetan.
Kıtêbên gıranbûha derketın
Jı dest çalakên Kurdan.
Lı ser doza te karkırın
Mehmûdê Beyazıdi
Goran, İsmayelê Bayêzdi

Institut Kurde de Paris

Metleba te pêşda çû
Bıngehek baş te dani
Mamosteyê hêja
Ehmedê XANİ
Pesn bo te dıvê,
Şayi bo te,
Nemıri tu,
Her tacê serê Kurdan,
Dılsozi welati tu.
MEM Û ZİN
Xwe berda
Rex Romeo û Juliett
Tenışta Leyla û Mecnûn
Cih gırt
Bı rasti serfıraz ın em
Sed eferin bo te
Dersdarê mezın,
Pısporê dûrbin,
Kalkê me yê hêja.
XANİ,
Jı Eli Heriri, Mele Cızıri hılda
Te Xaniyê Çanda Kurdi dani
Hejar, Bedırxanan
Heya Cigerxwin
Lı wi Xani da mezın bûn
Xemılandın dorberê Xani
Neqışandın
Kevırê diwaran

Institut kurde de Paris

Û serayek hewaskar pêkanin
Bo diroka Kurdıstan...
Gelê me,
Geleki kevn û şareza ye,
Û axê welatê me
Xêrdar e,
Bereket dıbarine
Ser hışên ewladên xwe,
Lema şagırtên te dıefrinın
Bê westan
Tıştên xweşık û bedew.
Xani,
Lı ser Kurdıstanê iro
Kevır kuçık na,
Top û bombe dıbare,
Lê me gav avêtiye bıhuştê
Saya serê te
Bıhuşta NÛBARA PIÇÛKAN
Û gıhiştın êdi em
Jı bo Kurdıstan...
Mamosteyê aqılmend,
Destbıkari, hunermendiya te
Dewlemendiya me ye
Pesn bo te dıvê
Dilan bo te
Nemıri tu
Her tacê serê Kurdan
Dılovani welati tu.
Dıviya bû tırba te,
Layiqê te me avabıkıra
Bı kaxızên heri xas
Me çap bıkıra
Efırandınên te,
Lê pır ne dûr e
Tu ji aza bi, rehet razê
Kêleka kela Bazidê
Dı nav axa kurdıstan.

Institut kurde de Paris

Qedır qimet bo te dıvê,
Cejn bo te
Nemıri tu
Her tacê serê Kurdan
Nişana Çanda meyi tu..

Institut kurde de Paris

HELEPÇE

Dergûş Bêrivan ket,
Jı destê pura Beyan
Ber destê toz û xûbara bombê,
Fenayi teyrokan deng derdıket
Bı sed, bı pêncsed
    Tev dıketın,
    Ser erda xwinavi
      Bê xwin,
      Bê dan û sıtandın.
Ew çûn,
Ew mındalên çê,
Lê wek fişek derket, çiçek
Jı dewsa şehidên Helepçê.

Adar 1988

Institut kurde de Paris

## EWRINO!

Ewrên reş,
Ewrên tari,
Ewrên bı jehr,
Ewrıno!
Jı landıka mın dûrkevın,
Bıhêlın dayik mın hemêz bıke.
Ewrên reş
Ewrên tari
Ewrên bı jehr,
Ewrıno!
Me hevalê xwe lı Hiroşimayê,
Me hevalê xwe lı Nagazakiyê
dit...
Nestinın, neşkênın,
Dûr herın
Jı totıkên mın!..

Adar 1988

Institut kurde de Paris

## EMRÊ ME-IV

Metin ji xort bû,
Xurt bû...
Haj bayê felekê bû,
Du neket pey rojên ne bıxêr,
Nekete nav rehetiya deman,
Ne serseri
Ne bı dest pê.
Qebzê şoreşê gırt,
Nav rışk û spiyan,
Pêşberi hov û cerdan,
Lı şkencexanan,
Xwe ra kozık çêkır,
Berxweda,
Û paşla belengazan da ma...
Kulilka nû bışkıvi,
Jı ser dara azadıyê
Şıkest ket.
Egidi û navê wi,
Dı nav dılê mınê agır da ma.

1987

Institut kurde de Paris

## GEWRÊ

Çaxa hember zıvıstanê
Şer dıke hêşınayi
Kulilkên berfê dıbışkıvın
Zorê dıdın erdê
Pêşiya sır û sermê
Û dema dıkele xwin
Nav rehên te
        Bıke bir
        Mın jı bir neke
Danê sıbê
Wexta zerayi dıkeve ser belekiya çiyan
Bayê şefeqê hışyar dıke
Tebiet û mexlûqetê
Û laçka te ya nexdekıri
Davêje jı serê te
Porê hewrışım derdıxine...
        Bıke bir
        Mın jı bir neke
Zemanê
Nav xas-baxçê azadiyê
Rûgeş dıgeri tev neviyên xwe
Xwezi tu ji hebûyayi nebêje
Û Bıla şıl nebın bıjangên xweşık
        Lê bıke bir,
            Mın jı bir neke.

21.10.1986

Institut kurde de Paris

Gava ajotıne ser
Dılteng bû
Zırav teqya, cida ma,
Dema zor kete ser mıli
Reşeve hat çav,
Wek hespê şıl bûyi
Hûn bêjın malê dınê
lê ne hat
Para ma.
Jı tevger dûrket,
Nerehet bû zewıci
Paşê mina çemê havinê
Mıçıqi ma...
Ne bo nefsa xwe
Ne ji bo civatê
Pêkani kareki,
Nota ava gola pıçûk
Geni bû,
Kurm kete dıli,
Sıtara xwe heband
Neherıki
Wext gıhişt
Mêjiyê wi rızi.

Institut kurde de Paris

## SERENCEM

Ceng ........ 5
Mıraz ........ 6
Govenda Me ........ 7
Were ........ 11
Pırtûkên me ........ 12
Bo me ........ 13
Ey heval ........ 14
Hevalê mın ........ 16
Gewra mın ........ 17
Çavreşa mın - I ........ 18
Jı bo ........ 19
Çiyayên me ........ 21
Êdi ........ 22
Gılidax - I ........ 23
Cıxare ........ 25
Zeri ........ 26
Çavreşa mın - II ........ 27
Mırın ........ 28
Xalo can ........ 29
Bûkê can ........ 32
Dil û azad ........ 34
Ken ........ 35
Bir ........ 36
Çavreşa mın - III ........ 37
Emrê me - I ........ 38
Emrê me - II ........ 40
Emrê me - III ........ 41

Institut kurde de Paris

Mıhacır ........ 43
Bes ........ 44
Rındi ........ 45
Dewran ........ 46
Newroz ........ 47
Sala nû ........ 49
Bayê Ararat ........ 50
Partiya mın ........ 51
Pêşmerge - I ........ 53
Lori ........ 55
Zarok ........ 56
Hêvi ........ 57
Şıır ........ 58
Hiv ne dost e ........ 59
Roja me ........ 61
Glidax - II ........ 62
Werın ........ 63
Newroz tê ........ 65
Tıvıng ........ 66
Stêrk ........ 67
Lı welati ........ 68
Bayizd ........ 69
Pêşmerge - II ........ 70
Yek Gulan ........ 71
Jı te dur ........ 72
Dılovan ........ 73
Pêş - I ........ 75
"Xani" ........ 77
"Xani" ........ 79
"Xani" ........ 81
Helepçe ........ 82
Ewrıno! ........ 83
Emrê me - IV ........ 84
Gewrê ........ 85

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris
Institut Kurde de Paris
IKPLIV107538
20